



MECLİSA JINAN A HDP'Ê RAPORA XIZANIYÊ YA JINAN

DESTPÊK

Newekheviya Zayendiya Civakî, her cureyên tundî, kuştin, cudakarî, kedxwari û neheqiya li dijî jinan pêş xistiye. Bi taybetî piştî pêvajoya şewba Covîd-19'ê, ev cudakarî û tundiya li ser jinan wekî li gelek welatên cihanê li Tirkîyeyê jî bandorek mezin li ser jinan kiriye. Di nava welatan de herî zêde li Tirkîyeyê jin bûne hedefa cudakarî û tundiyê.

Li gorî daneyên sala 2019'an ên Rêxistina Pêşxistin û Hevkariya Aborî (OECD), herî zêde li Tirkîyeyê jin bi cudakariya zayendî re rû bi rû mane. Tirkîye di nava 129 welatan de di rêza 26'an de cihê xwe girtiye. Welatê Tirkîyeyê di heman demê de endamê OECD'yê ye. Di nava welatên endam de herî zêde li Tirkîyeyê tundiya li ser jinan zêde ye. Li gorî daneyên fermî, li Tirkîyeyê ji destpêka 2021'ê heta 15'ê Mijdarê 251 jin hatine kuştin.

Em li vir nakevin nava pênasakirin û cureyên tundiyê. Li Tirkîyeyê jin bi hemû cureyên tundiyê re rû bi rû dimînin. Lê herî zêde tundiya fizîkî, zayendî, derûnî, aborî derdikeve pêş. Di bingeha hemû cureyên tundiya li dijî jinan de polîtîkayên dijminahiyê yên desthilata mêrpe-

rest heye. Cerebe û serpêhatiyên di hemû serdemên têkoşîna azadiya jinan de ev rastî derketiye pêşiya me. Dîrokê nîşan daye ku dîroka mêrê serdest, dîroka dijminahiya jinan e.

Feraseta mêrperest ya ku jinan tune dihesibîne, jinan cuda dike, di malê de hepis dike, bi fermana mêr ve girê dide û wekî kole dibîne; di 19 salên dawî de li Tirkîyeyê bêtir xwe daye der. Ev teyisîna wê nîşan dide bê li Tirkîyeyê dijminahiya li dijî jinan çiqas pêş ketiye. Dîsa nîşan dide ku dijminahiya li dijî jinan hatiye tescîlkin.

Li gorî qeydên di 19 salên dawî de bi qasî em dizanin 15 hezar û 813 jin hatine qetilkirin. Li dijî kuştina jinan, desthilata AKP'ê ku nûnertiya mêrê serdest dike, ev 16 sal in bi tena serê xwe bûye desthilat. Di 3 salên dawî de jî bi MHP'ê re tifaq çêkir û bû desthilat.

Mêrên ku jinan qetil dikin, li dijî jinan tundiyê pêş dixin, ji "halê baş" û "kravatê" sûdê digirin û cezayê wan tê kêmkirin. Piştî qeyûm tayînî şaredariyan hatin kirin, bi destê qeyûman navendên têkoşîna li dijî tundiya li ser jinan, malên stargehan, yek bi yek hatin girtin. Bi vê yekê jin bê parastin hatin hiştin. Bi sedan jin bi KHK'yan bi awayekî keyfî ji kar hatin derxistin. Peymana Stenbolê ku ewlehiya jiyana jinan bû, bi destê hikûmetê hat betalkirin. Bi vê yekê tundiya li dijî jinan hat rewakirin.

Mêrên ku li dijî jinan sûc kirin, bi zagona înfazê hatin berdan. Bi hezaran jinên ku têkoşîna azadiya jinan pêş dixin jî hatin binçavkirin û girtin. Bi vê yekê dengê wan tê qutkirin û dixwazîna jinan bihelînin.

Tifaqa mêrperest a AKP-MHP'ê bi polîtîkayên şer û tundiyê, welat xistiye kaosek pir kûr. Xistiye nava qeyrana aboriyê. Herî zêde jin berdêla vê qeyran û kaosê didin. Jin bi xizanî û tundiyê vê berdêlê didin. Jinan jî qada cemaweriyê dûr dixin û dixin hepsa malê. Bêtir bi mêr ve girê didin. Ji bo bêtir bi mêr ve girê bidin serî li hemû cureyên polîtîkayan didin. Di karên bê ewle û bê pêşeroj de didin xebitandin. Ked û karê jinan ê di nav malê de nayê dîtin. Jin bêtir bi karê malê hatine sînorkirin. Piştî pêvajoya şewba coronayê, keda jinan zêdetir hatiye xwarin. Kedxwariya jinan zêdetir mayînde kirine. Bi vê yekê jin bêtir xizan bûne. Dîsa di vê pêvajoyê de ewil jin jî kar hatin dûrxistin. Li şûna qada kar û debarê ji jinan re ava bikin; li qadên kar li ser jinan tundî pêş xistin, tacîz zêde kirin. Ji bo rê li ber vê tundiyê bê girtin tu gav nehatin avêtin. Li şûna rê li ber tundiyê bigirin bi zagona Kod-29'an rê li ber dûrxistin û jikardexistina jinan vekirine. Jinan bê îtîbar dikin. Ji bo jinan jî jiyanê kar dûr bixin, her tiştî dikin. Bi kurtasî; desthilatê pêvajoya şewbê ji bo xwe kiriye firsend. Bi vê yekê jinan bêtir di malê de hepis dike. Bi vê yekê re jî dixwaze rola "Jina maqûl" ava bike.

Xizaniya jinan ku her diçe zêde dibe; mirov nikare ji şer, polîtîkayên tecrîdê cuda bigire dest. Di encama polîtîkayên nijadperestî, zayendperestî û mîlîtarîst de, îro bi hezaran jin, malên xwe û qadên jiyanê terk dikin. Jinên ku ketin rêya koçberiyê, di rê de bi hemû cureyên tundiyê re rû bi rû dimînin. Jinên ku di van şertan de dijîn, xizaniya herî zêde dijîn. Diçin ku, bi cudakariyê re rû bi rû dimînin. Jinên penaber û koçber ên keda wan û heqê wan tê xwarin, îro di qada navdewletî de dibin mijara bazarê.

Li gorî çavdêriya Meclisa Jinan dîsa di qadên tekstîlan û nava karkerên demsalî de gelek zarok hene. Zarokên ku divê dibistanê bixwînin piraniya wan keçik in. Gelek keçik di karên demsalî de xebatê dikin. Keda zarokan tê xwarin. Mafê wan ê perwerdehiyê ji destê wan tê girtin.

Li gorî zikheviya Yekîtiya Ewropa (YE) rîska xizaniya jinan ji sedî 22,3 ye. Rîska xizaniya meran jî ji sedî 20,4 e. Li Tirkiyeyê jî rîska jinan a xizaniyê ji sedî 41 e. Rîska mêran a xizaniyê jî ji sedî 38,6'e. Tam ji ber vê yekê me dest bi kampanya "Ji Xizaniya Jinan re Na, Ji Bo Jinan Edalet"ê kir.

ARMANC

Wekî Meclisa Jinan a HDP'ê, li dijî tundiya li ser jinan, bi mîrateya tecrûbeyên paşerojê, ji bo em siberoja xwe ava bikin, me qad, kolan û kuçe tu carî terk nekirin. Ji bo em li dijî êrîşên li ser mafên xwe û destkeftiyên xwe bê-tir têbikoşin, me demeke dirêj nîqaş kirin. Piştî van nîqaşên berfireh, me nexşerêya serdema nû diyar kir.

Me di 10'ê sibata 2021'an de, dest bi starta kampanya

"Ji bo Jinan Edalet" kir.

Me kampanya di bin sernavên cûda de pêş xist.

Her sernavekî me yê xebatê girêdayî sernavê din e û hemû sernav girêdayî hev in. Li gorî vê yekê ewil me li dijî tundiya li ser jinan, tecrûda li girtîgehan, dîsa girêdayî wê lêgerîna tazî ya li girtîgehan, li dijî binpêkirinên mafan, li qadan, li dadgehan, li pêş girtîgehan me got "Ji

Bo Jinan Edalet". Me di 5'ê Nîsana 2021'an de li Stenbolê bi civîna çapemeniyê dest bi pêngava duyemîn a kampanyayê kir. Di pêngava duyemîn de me got "Ji Xizaniya Jinan Re Na, Ji Bo Jinan Edalet".

Di vê çarçoveyê de armanca şahî û çalakiyên ku me kir, dîsa hevdîtinên ku me kir, sedema sereke, me xwest li ser xizanî, kedxwarî û tundiya li dijî jinan guhdariya jinan bikin. Me xwest gotinên wan û dengê wan li her derê bidin bihîstin. Em bi jinan re hatin ba hev ku karkeriya çandiniya demsalî dikin, karkerên tekstîlê, yên li malê bi karê parçe dixebitin û hewl didin debara malbatê bikin. Em bi jinên koçer re hatin cem hev. Em li bajaran bi platformên jinan re hatin cem hev. Em bi jinên astengdar re li ser mijara "Em dikarin jiyaneke bê asteng çawa ava bikin" hatin cem hev.

Me li dijî budceya mêr a ku tifaqa mêr a AKP-MHP'ê amade kiriye, got; "Jin Budceyeke Çawa dixwazin?" û em bi rêxistinên jinan re hatin cem hev. Em li tax û gundan bi jinan re civiyan. Ji bo ked û karê jinan ê li malê bê dîtî, em bi hev re li ser çareseriyê axivîn. Me li pirs-girêkên wan, zor û zehmetiya karê wan guhdar kir. Me li wan guhdar kir ku çawa keda wan tê xwarin. Me li ku civîn çêkir û me xebat kir, me encama wê bi raya giştî re parve kir. Li meclisê di civînên koma partiya xwe de bi pirsname û nameyên lêkolînê, me hewl da li meclisê

bibin dengê jinan. Me hewl da dengê jinan li her derê bidin bihêstin.

Van hemû hevdîtin û civînan careke din nîşanî me da ku; jin bi tu awayî tu tiştî ji desthilata mêr a AKP-MHP'ê hêvî nakin. Dîsa me dît ku jin bi temamî xwedî biryar in ku di her qada hilberînê de cih bigirin û bi biryar in ku ew bi xwe qadên hilberînê ji bo xwe ava bikin û ji bo vê yekê têbikoşin.

Me rapor li ser esasê xizaniya jinan amade kir, bê daxwazên jinan û xebatên ji niha û şûn de bînin kirin çî ne û divê çî çawa bê kirin. Kampanya "Ji Xizaniya Jinan re Na, Ji Bo Jinan Edalet" ne kampan-yayeke demî ye. Ji niha û şûn de jî em ê naveroka kampanyaya xwe bêtir xurt bikin û em ê civîn û hevdîtinên xwe yê n bi jinan re berdewam bikin. Dane û agahiyên ku me bi dest xistine, em ê bi raya giştî re parve bikin. Em ê her dem û li her derê bibin dengê jinan û daxwazên wan parve bikin.

CIHÊN KU DI ÇARÇOVEYA KAMPANYA JI XIZANIYA JINAN RE NA, SERDANA WAN KIRINE

Serdana 18 bajaran û rêya bi dirêjahiya 13.550 km.

■ ÎZMÎR

- Li Karşıyakayê jinên muzîkjen anîn ba hev.
- Li Bayraklıyê serdana jinên xebatkarên tekstîlê hat kirin.
- Li Menemenê hevdîtin bi jinên Roman re hat pêkanîn.
- Li Konak ê em çûn serdana jinên karkerên mîdyeyê, firoşkarên gerok ên jin û jinên ku tendûran çêdik.
- Em bi Platforma Jinên Îzmîrê re hatin ba hev.

■ AYDIN

- Li Koşkê me serdana xebatkarên jin ên di zeviyê çîlekan de dixebitin kir.
- Li Sokeyê serdana jinên ku sîwanên hesîrê çêdikin hat kirin.

■ ANKARA

- Li Balayê serdana jinên karkerên demsalî ên ku li zeviyên pîvaz, pincar û kartolan dixebitin hat kirin.
- Komxebata jin û astengî

■ KONYA

- Li Kuluyê serdana jinên cotkar hat kirin.
- Li Cihanbeyli'yê serdana jinên xebatkarên serayê hat kirin.
- Komxebata budceya jinan hat lidarxistin.

■ RUHA

- Xebatkarên ku li zeviyên firingî, xiyar, îsot û bacanan dixebitin û jinên ku di zeviyên nîskan de berhevkarîyê dikin, hatin ziyaretkirin û bi jinên gundî re em hatin ba hev.

■ SEMSÛR

- Li Bulamê serdana hemû jinên xebatkar hate kirin û hevdişin bi wan re hat kirin.

■ DÊRSIM

- Li Hozat'ê serdana kooperatîfa jinan hat kirin.
- Li Ovacık'ê serdana jinên karkerên tekstîlan hat kirin.
- Hevdişina jinan a ekolojîyê hat pêkanîn.

■ AGIRÎ

- Li zozanên Sinek ê serdana jinên koçer hat kirin.
- Li gundê Ziro hevdişina jinan hat pêkanîn.

■ IXDIR

- Serdana jinên ku mişmişan berhev dikin û jinên ku li zeviyên pincarê de dixebitin hat kirin.

■ BEDLÎS

- Li Tatvan'ê serdana jinên ku firingiyan berhev dikin hat kirin.

■ EDENE

- Li Karataş'ê serdana jinên karker ên ku îsotan berhev dikin û jinên ku gûzan bi benan vedikin da ku bikin benî, hate kirin.

- Li Ceyhan'ê serdana jinên karker ên fistiqaan berhev dikin hate kirin.
- Li Gulbahçesi'yê hevdîtina jinan hate pêkanîn.
- Em bi Platforma Jinan a Adanayê re hatin ba hev.

■ ANTAKYA

- Li Îskenderun'ê hevdîtina jinan hate pêkanîn.
- Serdabna Koperatîfa jinên gundê eremenî hate kirin.
- Li Antakyayê Platforma jin bi hev re bihêzin û ya dayikên Geziyê lihev civiyan.

■ BURSA

- Bi jinên platforma Bursayê re em hatin ba hev.
- Serdana jinên karkerên zeviyan û tekstîlê hate kirin.

■ STENBOL

- Bi jinên mûzîkjen re em hatin ba hev.
- Komxebata budceya jinan pêk hat.

■ KOCAELİ

- Li Hereke'yê hevdîtina jinan pêk hat.

■ MELETÎ

- Li Dogaşehir'ê serdana hemû jinên karkerên tûtînê hate kirin.
- Li Kurecik'ê serdana jinên karkerên mişmişan hate kirin.
- Li gundê Nermikan serdana jinan hate kirin.

■ MÊRDÎN

- Li Midyadê em bi jinên suryanî re hatin ba hev.
- Li Qoserê me serdana jinên karkerên zeviyan kir.
- Komxebata Budceya Jinan hate pêkanîn.

■ DÎLOK

- Li navçeyên Şehitkamil û Şahinbey hevdîtina bi jinan re pêk hat.
- Jinên ku karan tînin malê hatin ziyaretkirin.
- Hevdîtin bi platforma jinên Dîlokê re hate kirin.

DI ENCAMA XEBATÊN KAMPANYA JI XIZANIYA JINAN RE NA, PIRSGIRÊKÊN KU DERKETIN HOLÊ Û PÊŞNI-YARÊN ÇARESERYÊ

1- JINÊN COTKAR ÊN XEBATÊN DEMSALÎ

Xizaniya ku jinên cotyar ên xebatkarên demsalî tê de dijî nîşane û wêneyê zordariya ku pergala kedxwariyê ya ku rejîma AKP-MHP li ser jinan ferz kiriye, radixe ber çavan. Jinên ku ji ber xizanî û tunebûnê dikevin ser rêya koçberiyê di rê de bi hemû rengên tacîz, istismar û cudakariyê re rû bi rû dimînin û ewlkarîya jiyana tukesan ji wan tune ye. Piraniya herî zêde ya jinên xebatkarên demsalî ji jinên kurd pêk tê. Ev jî ji siyasetên şerê qirêj ê ku li ser erdnîgariya kurdan tê meşandin ne cuda ye û encameke wê ya berbiçav e. Jinên ku ji bo xebatên karkerên demsalî diçin deverên din li wan cihan rastî hemû rengên êrîşên nijadperestî tên.

Her sal hema bêje di navbera 6-9 mehan de mala xwe û bîranên xwe terk dihêlin û neçar in ku wekî jinên karker ên xebatkariya demsalî bikin û hemû deverên ku diçinê jî li wan deran bi her rengê cudakariyê û marjînkirinê re rû bi rû dimînin. Çûna jinên xebatkarên demsalî tenê bi bajarekî re ne bi sînore, ew neçar dimînin ku cih û waran biguheînin ji cihekî herin cihekî din û bêtir wekî xebatkarên demsalî ên gerok dixebitin.

Ji Konya'yê ta Amasya'yê, Ji Edenê ta Bursa'yê carnan neçar dimînin ku gelek bajaran diguheînin.

Ev îstîsmarkirina kedkaran ku karkerên çandiniyê yên demsalî di gelek waran de pê re rû bi rû ne û nebûna daneyên kedkarên çandiniyê jî, nîşana wê



yekê ye ku hikûmet di warê jinavbirina xizaniyê de di vî warî de tu pirsgirêk çareser nekiriye. Ev gotinên jinên ku karkerên çandiniyê yên demsalî dikin, polîtîkayên hikûmetê bi awayekî zelal nîşan didin: Salê carekê an jî du caran tîn û li pirsgirêkan guhdarî dikin. Çend perçe pêlîstokan didin zarokan û diçin û qet li paş xwe nanêrin. Xemeke wan ji bo çareserkirina pirsgirêkên ku em dijîn tune ye.

Pirsgirêkên kedkarên çandiniyê yên demsalî ku temenê wan di navbera 12 û 65 salî de ye, ji îfadeyên jinan û çavdêriyên me hatine berhevkirin û encamên jêrîn derketine holê.

1.1 Jinên karker ên çandiniya demsalî di konan de dijîn

- Di rewşa pandemiye de tevê ku tu tedbîr nayên girtin jî bi sedan jin û zarok di çadîran dijîn.
- Jin tevî endamên malbata xwe di konan de dijîn. Di her konî de herî kêr 10 jin dijîn.
- Di konan de pirsgirêka avê domdar e. Jin ji bo xwe bigihînin avê bi kîlometreyan rê dimeşin.
- Ji ber tunebûna avê kinc, firak û xwe şuştin ji bo jinan hatiye asta îşkenceyê.
- Rojê seateke tenê ceyran berdidin û li van konan

barê herî giran li ser milê jinan dimîne. Ji ber fatûrayên giran ceyrana ku tê berdan jî nayê bikaranîn.

- Di parselên ku 10 kon têde hene ji 18 kesan re tenê serşokekî dikeve para wan. Herî dawî mafê xwe şuştinê dikeve para jinan.
- Herî kêr 10 kes heman tûvaletê bikartînin. Ji ber tunebûna avê ev rewş ji aliyê tenduristiyê ve xetereyan derdixe holê.
- Di şiliyeke herî kêr de jî hidûrê konan tije av û herî dibê. Di vê rewşê de komkirina konan û paqîkirina wan li ser milê jinan dimîne.

1.2 Jinên karker ên çandiniya demsalî ji xizmetên tenduristiyê bêpar in

- Şert û mercên konan ku ji her nexweşin û şewbayê re vekirîne, tevî rewşa pandemiye jî tu tedbîr nayê girtin.
- Bi gelemperî ev kon durrî bajarên hatine avakirin ji ber wî jî kes nikare xwe bigihîne xizmetên tenduristiyê.
- Jinên karker ên çandiniya demsalî bêsîgorta û der-vayê qanûnî dixebitin.
- Jinên karker ên çandiniya demsalî di mirina pitikan a di zayînê de û mirina zarokan de di asta herî jor dene.

1.3 Jinên karker ên çandiniya demsalî di kategoriya ku herî zêde keda wan tê xwarin de cih digirin

- Jinên ku rojê 12-14 seat dixebitin rojana di navbera 60 û 110 TL'yî de pere digirin. Heqdest li gor zayend û temen tê diyarkirin.
- Ji ber ku heqdestê jinan didin mêran bi gelemperî jin nizanin ku çi qas heqdest digirin.
- Jin bi gelemperî heqdestê xwe didin pêwistiya malê û yên zarokan.
- Budceya jinan ya ku ji bo pêwistiya xwe veqetînin tune ye. Budceya wan ya heya têra pêwistiya wan ên bingehîn jî nake.
- Lêçûnên çûyîna zewiyê, xwarin û vexwarinê tev jin didin. Tu ewlehiya jiyanê jin û zarokên ku bi traktorê derin zewiyê tune ye.
- Jinên ku di zewiyê bi îcare hatine girtin de dixebitin diyarê dikin ku ji ber kêmasiya av û ceyranê hilberîna kême.
- Jinên kedkar ên ku karê titûnê dikin dibêin ji ber kotaya ku danîna ser titûnê em nikarin heqê keda xwe bigirin û me dane ber bextê sermayedarên.

- Jinên kedkar ên ku mişmişan kom dikin li ser heqdestê ku digirin wiha gotin: "Perê ku ez digirim heta diçim malê diqede. Di destê min de perê potîkê zarokên min jî namîne."

1.4 Jinên ciwan ên karkerên çandiniya demsalî nikarin perwedeya xwe bidomînin

- Jinên ciwan ên ku nikarin krediyên perwedeyê bidin û yên ku zanîngê qedandine û tayîna wan nayê kirin neçar dimînin ku di karê çandiniya demsalî de bixebitin.
- Ji aliyekî de jinên ciwan li zewiyê dixebitin ji aliyê din ve jî xizmeta zarok û temenmezina dikin.
- **"Dayika min diyabet e, bi bavê min re jî nexweşîna dil heye. Ji berk u tîm li vir dixebitim dikarim herim dibistanê. Min dixwest ez herim dibistanê û bibim bijîjk. Ji hêza xwe bêtir bar hildigirim."**

1.5 Jin û zarokên mexdûr ên karkerên çandiniya demsalî bêzar in

- Bi hezaran zarok ji ber ku malbatên wan karkerên çandiniya demsalî ne nikarin perwerdeya xwe bidomînin û li zewiyê mezin dibin.
- Di rewşa pandemiyê de zarok ji ber ku nikaribûn

xwe bigihînin tablet û înternetên ji perwedeyê bêpar man. Newekheviya di navbera mafê perwerdeyê de di dema pandemiya de kurtir bû.

- Keçên di serdema dibistana amedayiyê de ne ji ber xizantiyê neçar dimînin ku di zeviyan de bixebitin.

- **“16 salî me. Diçim pola 6’emîn. Neçar im ku bixebitim. Em ê ji vir herin Eskîşehirê.” Ev gotin gotinên tenê yek ji zarokên keç in ku neçar dimînin di zeviyan de bixebitin e.**

1.6 Jinên mexdûr ên şer zêdetir tîn mêtinkirin

- Keda jinên ku ji ber şerê li Efrîn, Kobanê û Raqayê neçar mane û hatine Tirkîyeyê zêdetir tîn xwarin.

- Ji ber ku jinên koçber neçar dimînin bi sîmsaran re dixebitin heqdestê kêmtir digirin. Jinên ku 90 TL digirin 15 an jî 20 TL’yê xwe didin sîmsaran.

- Jinên ku sigortaya wan ya tendirustiyê tune ye nîkartin ji mafê tendirustiyê sûd bigirin.

- Pîrê jin ne di stantuya penaber an jî mişext jî nayên dîtin.

- **Jinên karker ên çandîniya demsalî;**

- Ji bo jiyana wir hêsantir bibe bila konteynira bînin qada konan;

- Ewlekariya civakî bê dayîn;

- Bila derfetên tenduristiyê bêpere bê dayîn;

- Ji karê wek hev re heqdestê wek hev;

- Bila heqdest bê zêdekirin û seatên kar bê sererastkirin;

- Mafê perwerdeyê zarokan;

- Jin dixwazin malên ku hilberîna wan kirine bil abi rihetî bikaribin ji bazar, market û sûkê bikirin.

Daxwazên jinên karker ên çandîniya demsalî daxwaza her jinên ku alîgirên heq, hiqûq û edeletê ne ye.

WEK MECLİSA JİNÊN HDP'ê;

- Em ê li her qadê bibin dengê jinên karker ên çandiniya demsalî û em ê cîhekarî û îstîsmara ku dibînin teşhir bikin.
- Em ê hewl bidin ku projeya xwe ya bi navê “Li ku ji dayikbûbim ez ê li wir têr bi-bim” bikin meriyetê.
- Em ê piştgirî bidin ku jinên karker ên çandiniya demsalî biewlehî bên îstîhdamki-rin.
- Ji bo ku jin bikaribin li cîh û warê xwe bi ewlehî kar

bikin em ê cihê kar ji nû de vebikin.

- Em ê kursan vebikin û ji bo jinên ku van kursan qedandin qadên kar ên wek hev û azad ava bikin.
- Ji bo jinên ciwan xwe bikaribin bigihînin mafê perwedeyê em ê polîtîkayan pêş bixin.
- Ji bo jin bikaribin bê sîmsar malên ku hilberîna wan kirine bifiroşin dê em ê koo-peratîfan ava bikin.
- Em ê nehêlin ku keda jinan bêîstîsmarkirin û zayenda koçkirinê bibe jin.



2- JINÊN KEDKAR ÊN TEKSTÎLÊ

Wekî di her karekî sektora taybet de, jin jî di atol-yeyên tekstîlê de weke keda erzan tên dîtin û rastî her cure mobbing û îstismarkirina kedkaran a ji alî patronan, tên. Karkerên tekstîlê yên ku di karên xeternak ên kêmpere de dixebitin neçar in ku rojê ji 10 saetan zêdetir bixebitin. Pir caran, jin di heftê de tenê rojekê dikarin betlaneyê bikar bînin. Piraniya jinên ku di qada tekstîlê de dixebitin jinên ciwan in ku jiyan xwe ya perwerdehiyê neqedandine an jî ji ber xizaniyê bi tu awayî nikaribûne perwerdeya xwe temam bikin. Bi taybetî di pêvajoya pandemiya de, dema ku hem xizani û hem jî îstîsmar bi kûrahî tê jiyîn, serlêdana Kod-29 gefan li jinan dixwe. Li atol-yeyên tekstîlê ku yek ji qadên metirsiya belavbûna vîrusê lê zêde ye, jin bi mûçeyên kar ên demkurt û bi fikarên ji karavêtinê re rû bi rû mane.

Jinên kedkar ên tekstîlê;

- Ji bo karê wekhev heqdestekî wekhev;
- Divê dawî li mobbing, taciz û tundiya li cihên kar li jinan tê, were;
- Debar bi mûçeya kêmtirîn nabe, divê mûçeyên wan werin zêdekirin;
- Ji ber xizaniyê neçar mane ku dawî li xwendin û perwerdeya xwe bînin;
- Ji bo ku bikaribin fatûreyên xwe yên elektrîk û gaza xwezayî bidin hewcedarî bi hebûna mûçeyên standard heye;
- Divê beççeyên zarokan werin avakirin, ku bikaribin bêpere û bi rengekî ewle zarokên xwe lê bihêlin werin avakirin;
- Em daxwaz dikin ku dest ji gefên bidawîkirina karên wan were berdan.

Daxwazên karkerên tekstîlê yên ji bo jiyaneke jinane û mirovî; daxwaza hemû jinane li dijî desthilata mêr a ku tehemûl nake jinan serkeftî û berhemdar bibîne.

WEKÎ MECLISA JINAN A HDP'Ê;

- Em ê dawî li wê hêza desthilatdar a mêr bînin ya ku gefa derxistina ji kar li me dike, kedxwariyê dike û me wekî keda erzan dibîne.
- Em ê li hember tacîz, mobîng û destdirêjiya ku di sektora taybet de jin pê re rû bi rû dimînin, bêdeng nemînin.
- Em ê wan kesên ku bi derxistina ji kar gefan li me dixun li her derê teşhîr bikin û bihetikînin.
- Em ê her dem cihê xwe ne li kêleka patronan lê li kêleka karker û kedkaran bi-girin.
- Em ê li her deverê û bi hêza ku em ji jinan digirin û bi muxalefeta jinan, kar bikin ku kêmtirîn mûçe derkeve 6000 TL.
- Em ê pirsgirêkên ku jinên kedkar ên tekstîlê pê re rû bi rû dimînin bêtir bînin rojeva meclisê û em ê têkoşîneke xurtir bikin ji bo ku daxwazên wan bînin cih.
- Em ê ji bo ku li her derê bexçeyên zarokan ên bêpere û berfireh werin vekirin, têbikoşin.





3 JINÊN LI MALÊN XWE KARÊN DIN DIKIN

Pergala ku ji bo patron û sermayedaran di aliyê kirê, servîs û gelek mesrefên din de erênî ye, ji bo jinên karên malan dikin kedxwarî û mafxwarî ye. Jinên ku ji ber xizaniyê neçar dimînin debara malbatê bikin û kar bikin, her diçe keda wan bê qîmet dibe. Jinên ku bi keda erzan rojê 12 saetan kar dikin, tu ewlehiya wan a tenduristî û civakî tune ye. Mafê wan ê hiqûqî tune ye. Di hemû serdanan de ji ev rewş derketiye holê. Jinên ku ji sibê heta êvarî gwîzan dişkînin, qinê gwîzan bi ta vedikin, jinên ku posa tirî cuda dikin, karkerên şimikan, li qadên konan siwanan çê dikin, di dawîya rojê de di navbera 10 lîra û 30 lîra de pere qezenç dikin. Jinên rojê 50-60 kîlo posayê tirî çêdikin, tenê 30 lîra qezenç dikin. Jinên ku rojê cewalek gwîz dişkînin û qinê wan bi ta ve dikin, tenê 10 lîra qezenc dikin. Jinên bi kedek mezin rojê 2 sîwanan çêdikin jî rojê 20 lîra qezenc dikin. Jinen karên tekstîlê dikin û rojê hilberîna 100 parçeyan dikin, rojê tenê 10 lîrayan qezenc dikin.

“Ez banga xwe li vê dewletê dikim. Pere tune. Ez ê nikaribim zarokên xwe bişînim dibistanê. Ez 11 saetan kar dikim. Rojê tene 30 lîra qezenc dikim. Ez nikarim heqê nanê xwe derxim. Ez neçar im kar bikim. Heta êvarî ronî di çavê min de namîne. Ez nikarim kîra mala xwe bidim. Dê di hîlbijartinê de bibînin. Ez tenê pereyê komirê ji dewletê digirim. Ceyran û av çiyê? Heqê fatûra ceyranê 130 lîra tê. Heqê fatûraya avê 100 lîra tê. Ez nexweşa astimê me. Ne ez tenê hemû jin bi heman rengî ne.”

“Ez 55 salî me. Hemû emrê min bi kar û xebatê derbas bû. Ez li dehan bajaran geriyam. Karê ku min nekir tune. Mehê pereyê cîhanekê distînin. Xwedê ji wan ne razî be. Xizan dimirin û zengîn jî lê te-maşê dikin. Ez ji 9 saliya xwe heta niha bajar bi bajar geriyam. Ez di fabrîqeyên çewal û garisan de xebitim. Dawiya dawî ez ketim. Niha ez karê torbeyên tirî dikim. Ji Sîwe-rekê heta Sokeya Îzmîrê, Heta Derya Rer... Ez li her derê geriyam. Min li her derê konê e danî. Min tenê karek kiribûya niha 2 caran ez teqawîf bûbûma.”

Di hevdîtinên jinên li malan kar dikin de, hemû jinên li malan kar dikin, kedxwarî û mafxwariya wan wêneyê hemû jinên welat e. Karê li herêmê li gorî herêma din tê guhertin. Lê di hemû karan de wêneyê hevpar keda jinan û mafê jinan tê xwarin. Qîmeta keda jinan nayê dîtin. Jinan ji sektorên kar dûr dixin û wan di mal de didin xebitandin. Bi pergala xebata li malê, di heman demê de jinan bêtir li malê hepis dike. Bi vê yekê rola zayendiya civakî bêtir xurt dikin. Wekî milekî kar derdikevin pêş.

Ji bo jinên ku li malê dixebitin;

- Rewşa wan bibe wekî karkerên tomarkirî û xwedî ewlekariya civakî.;
- Divê pereyên bi qasî bikaribin dawiya rojê pêdiviyê xwe pêk bînin werbigirin.;
- Divê ji bo zarokên ku ji ber xizaniyê nikaribûn perwerdeya xwe bidomîn, şet û mercên berdewamiya xwendinê werin peyda kirin.
- Divê kiraya wan were dayîn;
- Divê ku tu zarok nekeve hetra kirîna cilan an jî

çete an jî çî melzemeyeke ji bo dibistanê lazime;

- Divê ew bi tena serê xwe berpirsiyara xwendina zarokan negire ser xwe;
- Em daxwaz dikin ku deynên yurdê û KYK yê xwendekarê zanîngehê yên jin ku li malan dixebitin, werin jêbirin.

WEKÎ MECLISA JINAN A HDP'Ê;

- Em ê ji bo bidestxistina ewlehiya tenduristiya û kar têbikoşin.
- Em ê li her deverê vê yekê bikin rojev ji bo ku jinên xebatkarên li malê statuya jinên karker bigirin.
- Ji bo ku ew bikevin statuya karkeran, em ê pêşin-yarqanûnekê pêşkêş bikin û em ê bi hemû hêza xwe ji bo pejirandina wê muxalefetê bikin.
- Em ê têbikoşin ji bo imzekirina Peymana Kar a Navnetewî ya Hejmar 177 ku ji aliyê Rêxistina Xebatê ya Navneteweyî ji bo karkerên li malê.

4- JINÊN HUNERMEND

- Bi pêvajoya pandemiyê re, bi taybetî di nêzîkatiyên li ser muzîkjenên jin û hûnermendan de polîtîkayên hunera zayendperest zelaltir xuya bûne. Zayendiya huner û mûzîkê tune ye. Her wiha di hev-dîtinan de derket holê ku jinên têkoşîna hunera xwe didin, di pêvajoya pandemiyê de mehkûmî xizaniyê bûn. Jinên muzîkjen ji ber qedexeyên pandemiyê nikarin bixebitin û bi rûyê herî giran ê feqîriyê re rû bi rû mane. Jinên muzîkjen ên bê ewle û qeydkirî neçar bûn ku amûrên xwe bifroşin da ku di dema pandemiyê de debara xwe bikin. Dema ku qedexeyên pandemiyê hatin rakirin, hêza serdest a mêr polîtîkayên xwe yên li dijî hunerê domandin û qedexekirina muzîkê di demjimêr 12:00 de berdewam kir da ku dengê hunerê kêmbike. Peymanên kar dikare ji hêla patron ve bi kêfî were betal kirin. Di dawiya rojê de mûzîkjenên jin ên ku di navbera 150 û 200 TL de distînin, beriya derkevin ser dikê neçar man ku gelek zehmetiyên wekî çûnûhatin, xwarin û veguheztinê derbas bikin. Jinên mûzîkjen ên ku saetên wan ên xebatê di destê patronên wan de ne, rastî pêkanînen kêfî hatine. Ev jinên ku rastî her cureyên taciz û tecawuzê tî; di mijarên wek cil û bergan de jî rastî mudaxleyên patronan tî.

- Desthilatdariya serdest a mêr a ku li hember ziman û çandên cuda bêtehamul e, bi taybetî di muzîk, huner û şanoya kurdî de her cure astengî û astengiyan datîne pêşiya hunermendan. Vê hişmendiye bi qedexekirina şanoya kurdî û aste ngkirina xebatên navendên perwerdehiya kurdî, xwest ku jin bi zimanê dayikê hunerê nekin.

Jinên hunermend;

- Muzîkjen karê bi ewle û pêkanîna îstîhdamê;
- Ji bo sûd ji pereyên bêkariyê werbigirin;
- Ji bo dahetan diyarkirina buhayê zemînê û ewlekirin;
- Li hemberî tundî, tacîz, mobîngê girtina tedbîran;
- Ji di zimanê zikmakî de hunera xwe îcra bikin;
- Ji bo avakirina qadeke azad a hunerî ya ku tê de ziman, çand û hunerên cihê bi rehetî werin pêşandan;
- Ew ji bo dengê hunera wan qut nebe; daxwaz bikin;

EM WEK MECLISA JINAN A HDP'Ê;

- Ji bo ku hunermendên jin bi awayekî azad hunera xwe bimeşînin, em ê bi însiyatîfa xwe zêdetir navendên çand û hunerê vekin.
- Em ê bi navendên çand û huner a jinan ên heyî re hev girtina xwe berfireh bikin.
- Em ê piştgiriye bidin jinên hunermend ên ji nasname û çandên cuda û bi lidarxistina civînên bêhempa deng û hunera xwe li her derê bidin bihîstin.
- Em ê ji bo vekirina atolyeyên hunera jinan û perwerdeya bêpere ya jinên muzîkjen polîtîka-yan pêş bixin.
- Li hemberî kesên ku dixwazin dengê huner û muzîkê kêmbikin em ê têkoşîna jinan mezin bikin.

5- KOOPERATÎFÊN JINAN

Her çiqas kooperatîf qadeke ku divê zêdetir bên berfirehkirin jî ji bo ku jin berhemên ku hildiberînin bêyî navbeynkariyê li qadên îstîhdamê bifroşin jî, dewlet ji bo vê jî ti polîtîkayêke teşwîqê nake. Ji xeynî avakirina kooperatîfên jinan û hilberîna bê navbeynkar, ji bo damezrandina kooperatîfan prosedûr li ser prosedûran tên zêdekirin û bi vî rengî rê li ber kooperatîfên jinan tên girtin. Sermayedar jinann ji qada hilberînê dûr dixê û bi vî awayî piştgiriya dide polîtîkayên patroniyê. Ji vê yekê carekî jî gavek paş de neavêtin. Bi armanca derxistina jinan a ji qada îstîhdamê, êrîşî bazarên taxên jinan ên ku berhemên xwe lê difroşin, kirin. Tevî desthilatdariya mêr a ku her cure polîtîkayên mêtîngeriyê dimeşîne jî, kooperatîfên jinan tên avakirin û jin bi derfetên xwe rêyên firotina berhemên xwe dibînin. Di serî de helwesta xurt û bi biryar a jinan a di serdanên kooperatîfan de careke din nîşan da ku her erk dikare bi ser bikeve.

Jin li cihên ku lê dimînin de, di qadên kar ên cuda de bi kooperatîfbûyîna de hem îstîhdama jinan berfirehtir dikin û hem jî nîşan dide ku bi hêza xwe, dikare bijî. Jinên ku ji fêkî û sebzeyên bostanên xwe rîçal, hingiv, marmelat, sabûn û rûnê zeytê çêdikin; Jinên

ku kooperatîfên tekstîlê ava dikin, berhemên xwe dirûtin û bi derfetên xwe difiroşin, wateya rast a kooperatîfbûyîna jî derdixin holê. Jin bi rêya kooperatîfên din jî berhemên xwe difiroşin. Ew berhemên xwe bi rêya hesabên medyaya dijîtal jî difiroşin. Damezrênerên kooperatîfan ku dahata xwe bi jin û xwendekaran re parve dikin, mînakê herî baş a hevgirtina jinan didomînin. Jinên ku kooperatîfa bi 5 jinan dest pê kir û ji 35 jinan re îstîhdam çêkir; yê bi 3 jinan destpêkirî û niha zêdetirî 20 jinan îstîhdamkirî, bi van gotinan bal kişandin ser girîngiya kooperatîfan:

Em fêkiyên li herêma xwe tên çandin, bi kar tînin û li ser medyaya dijital difiroşin. Berê ev fêkiyên me bi vî awayî nedihatî bikar anîn. Sêvên tev diriziyar. Lê niha bi vî karê me êdî fêkiyên me narizin.

Jinên ku di kooperatîfan de dişixulin;

- Naxwazin ku fêkî û sebzeyên wan di destê wan de bimînin, li cihêkî ku li bîfiroş in;
- Naxwazin ku aboriya wan girêdayî mêran be;
- Li navendên jîngehan di cihên febrîqeyên ku zîrê didin xwezayê na; atolyeyên hilberînê berbelav bibe;
- Û daxwaza zêdetirîn kooperatîfên jinan taleb dikin.



EM WEK MECLISA JINAN A HDP'Ê;

- Em ê dev ji polîtîkayên xwe yên ku dê kooperative jinan berfireh bikin û piştgiriyê bidin, berne-din.
- Em ê li dijî rakirina astengiyên li pêşiya avakirina kooperatîfên jinan derkevin.
- Em ê bi polîtîkayên xwe yên rêveberiyên herêmî dest ji pêkanîna bazarên taxên jinan 'Marketên Mor', yên aîde jinan û 'Bexçeyê Bajaran' bernedin.
- Em ê piştgiriyê bidin gund û kooperatîfên ekolojîk ên ku jin bi nêzîkatiya ekolojîk û jin-navendî tevbigerin û di hilberîna çandiniyê de nirxê bidin çêkirin.
- Em ê piştgiriyê bidin komên û kooperatîfên kuçe û taxan.

6- JINÊN KOÇER

Jinên koçer ên debara xwe bi sewalkariyê dikin, di demsala havînê de derdikevin zozanan. Di nava salê de herî kêr 3-4 mehan li zozanan dijîn û ji bo debarê bikin têdikoşin. Jinên ku li zozanan koçeriyê dikin, ji ber qedexeyên walîtiyê yên bi hinceta "polîtîkayên ewlehiyê", nikarin biçin li qadên bi bereket konên xwe dînin. Nikarin li van qadên bi bereket sewalên xwe biçêrînin û xwedî bikin.

Ji ber ku her diçin zozan li wan tînan bisînorkirin, berdêla kîraya zozanan jî zêde dibe. Jinên ku derdikevin zozanan her yek ji wan rojê nêzî 100 mihî didoşin. Jinên ku ji şîr penêr çêdikin, ji ber bazara ku lê penêrê xwe bifiroşin tune ye, nikarin qadixê xwe bifiroşin cihekî din. Ji ber vê yekê xwediyên şîrxaneyan (mandira) li gorî xwe buhayê şîr diyar dikin. Şîrkane kilmoya şîr bi 15-16 lîra dikirin û li marketan bi bi 40-50 lîrayî difiroşin. Bi vê yekê keda jinên koçer dixwin. Yê qezenç dikin bazirgan, simsar, elafê û xwediyê şîrxaneyan in. Sermayedar li ser keda jinên koçer qezenç dikin.

Jinên koçer li aliyekî keda wan tî xwarin, li aliyê din ji ber xizaniyê nikarin zarokên xwe perwerde bikin.

Mafê perwerdehiyê ji destê wan tî girtin. Li zozanan ceyran tune û bi kedek mezin avê peyda dikin. Jinên koçer bi bîdon û meteran ava vexwarin û û şuştinê temîn dikin. Jin pereyê şîr û penêrê ku bi kedek mezin bi dest dixin jî didin mêran.

"Li vî welatî bê edaletiyek pir mezin heye. Înternet tune. Heftetek mabû ku dibistan biqede tablet dan. Ez û du xwûşkên xwe em bi rêya telefonê dersê dibînin."

Jinên Koçer;

- Dixwazin ku qedexeyên zozanan bi dawî bibe. Dixwazin serbest pezê xwe li qadên bi bereket biçêrînin û hilberîna bikin;
- Dixwazin zozan bêsinor bin û pereyê kira zozanan hindik bidin;
- Ji bo firotina qatixê şîr û penêr, dixwazin qadên bazarê bê vekirin;
- Dixwazin qanalên avê û xetên ceyranê bikişînin zozanan;
- Dixwazin zarokên wan bi hêsaniyê ji mafê perwerdehiyê sûde bigirin.

WEKÎ MECLISA JINAN A HDP'Ê;

- Ji bo qedexeyên li ser navê “Ewlehiyê” hatine danîn bêne rakirin em ê têbikoşin.
- Ji bo jin berhemên şîrê xwe bifiroşin em ê qadên bazarê ava bikin.
- Ji bo ked û hilberîna jinên koçer bêne dîtin em ê têbikoşin.
- Ji bo pirsgirêka ceyran û avê ya ku jinên koçer dijîn bi dawî bibe, em ê mijarê bibin rojeva meclisê. Ji bo çareseriyê em ê muxalefeta jinan mezin bikin.



7- JINÊN XWEDÎ BAWERÎ Û NIJADÊN CUDA

Di welatê ku dixwazin rejîma yek zilamî ava bikin de, berdêla herî mezin a rejîma yek zilamî dîsa jinên xwedî bawerî û nijadên cuda, didin. Tifaqa mêr a AKP-MHP'ê ya ku bi hişmendî û polîtîkayên yekperest, mîlîtarîst û zayendîperet hewl didin bijîn, bi siyaseta ku cudahiyan qebûl nake dibe sedem ku jinên xwedî çand û baweriyên cuda travmayên giran bijîn.

Ne tenê jinên xwedî baweriyên cuda, di heman demê de jinên xwedî çandên cuda jî dibin hedefa polîtîkayên cûdakar, zayendîperest û marjînal. Di hevdi-tinên jinên Roman û Sûriyeyî de ev rastî şênber hat dîtin.

7.1 Jinên Roman

Jinên ku ji ber nasnameya xwe herî zêde bi cudakariyê re rû bi rû dimînin, mahkûmî xizaniyê têne hiştin, nasnameya wan tê înkarkirin, jinên roman in.

Jinên roman, li qadên ku lê dijîn nikarin pêdiviyên xwe yên herî mirovî jî pêşwazî bikin. Mafê starê mafekî herî bingehîn e. Lê jinen roman pêdiviyên xwe yên destafê jî neçar in ku li malên din bibînin. Di serdan û hevdi-tinên hatin kirin de bi taybetî di pêvajoya şewbê de, mêr ji ber bêkariyê li mal mane. Ji ber vê yekê tundiya li dijî jinan jî zêde kirine. Jinên roman berê di sektorên şahî û muzîkê de dixebitîn û debara xwe dikirin. Piştî pêvajoya şewba vîrûsê, ji ber ev sektor hatin girtin, bi betalî û xizaniyê re rû bi rû hatin hiştin. Jinên roman ji bo debara xwe bikin neçar man ku karê bêqeyd û bêewle bikin. Van şertên xebatê her tim rîska tundiya tacîz û îstismarê zêde kir. Jinên roman ku di her qad û pişeyî de kar dikin, bi hişmendiya hatiye avakirin, tenê bi karkerên sektora şahî û muzîkê têne nasîn. Ev jî dibe sedem ku ji aliyê civakî ve bêne wêdekirin. Agahiyên ku zewaca zarokên keç heta temenê 12-13 salî daketiye di nava cemaweriyê de hatiye belavkirin.



Jinên Roman;

- Debar û karê bi ewle dixwazin;
- Dixwazin xwedî nasnameyek azad bin û azad bijîn;
- Dixwazin di serî de mafê starê û pêdiviyên sereke bêne mîsogerkirin;
- Dixwazin polîtîkayên dûrxistina ji civakê û polîtîkayên marjînalîyê bi dawî bibe;
- Dixwazin di qada jiyanê de bingeha xizmeta teknîkê bê avakirin.



WEKÎ MECLISA JINAN A HDP'Ê;

- Em ê bi jinên roman re bêdir di nava şewirê de bin.
- Ji bo bigêjin mafê karê ewle û debarê em ê li her qadê têkoşînê mezin bikin.
- Ji bo qadên jiyanê bêne başkirin, em ê zextan li rêveberiyên herêmî bikin.
- Em ê çalakî û bernameyên xwe yên ji bo piştevaniya jinên roman zêde bikin.

7.2 Jinên Suryanî

Jinên Suryanî, hem ji ber baweriya xwe û hem jî ji ber nasnameya xwe berdêlên pir giran didin. Bi taybetî di demên borî de ji ber sûcên mirovahiyê yên li dijî jinên suryanî pêş ketin,

Bandora vê yekê îro dibe sedem ku jinên suryanî ji ci-vakê bêne dûrxistin, nêzîkatiyek zayendîperest li dijî wan pêş bikeve. Gelek jin ji ber wêdekirin (dûrxistin) û pirsgrêkên ewlehiyê, qadên jiyanê terk dikin û koçî dervê welat dikin. Zarokên suryanî yên li dibistanan ewlehiya jiyana wan tune, hem ji aliyê mamosteyan û hem jî ji aliyê zarokên din ve bi gotinên “Hûn ê ne-çin bihiştê”, “Li baweriya xwe veşerin” rastî tundiyê tên. Jinên suryanî yên debara xwe bi sewalkarî û çandiniyê dikin, dîsa ji ber bawerî û nasnameya xwe nikarin berhemên xwe bifroşin. Jinên ciwan ên dibistanê dixwînin ji ber tacîz û tundiyê neçar dimînin ku dibistanê terk bikin û mafê wan ê perwerdehiyê tê astengkirin. Li dijî van zext û tundiyê tu polîtîka nayê pêşxistin. Zorê li gundên suryanan zorê li suryanan dikin ku bi zorê bibin musulman.

“Ji ber ku em suryanî ne, şîr û penêrê me nakirin... Ma sewalen me jî Suryanî ne?”

Jinên Suryanî;

- Dixwazin ku dema zarokên wan diçin dibistanê bêyî fikara ku tiştêk bê serê zarokên wan bijîn;
- Dixwazin bi ewle û azad baweriya xwe bijîn;
- Dixwazin bêyî ku baweriya xwe veşerin ber-hemên xwe bifroşin;
- Dixwazin ji ber zext û tundiyê xanî û gundê xwe terk nekin û li warê xwe bijîn;
- Dixwazin polîtîkayên înkâr, wêdekirin û marjînali-ya li dijî wan bi dawî bibe;
- Dixwazin jinên ciwan bi ewle û bê tirs perwerde-hiya xwe bidomînin.



WEKÎ MECLISA JINAN A HDP'Ê;

- Em ê bi jinên xwedî nasname û baweriyên cuda re bêtir di nava şêwirê de bin.
- Em ê li dijî her cureyên înkâr û wêdekirinê têkoşîna xwe mezin bikin.
- Em ê bi kargeriyan ku mirovan diqin ferqa rastiye mirovan binin cem hev.
- Em ê piştgiriyê bidin qad û pazarên ku jin bi rehetî karibin berhemên xwe lê bifiroşin.
- Ji bo jinên ciwan di qada perwerde û jiyana civakî de bi cudakarî û tundiyê re rû bi rû nebînin em ê polîtîkayan pêş bixin.

8- PLATFORMÊN JINAN Û HEVDÎTINÊN JINAN

Platformên jinan, cih û qadên ku jin li dijî hemû cureyên tundiya li dijî jinan têkoşîna dimeşîne, di nav de ji gelek beşan jinan lê cihê xwe digirin, gotinên hevpar û çalakiyan bi hêz lê pêş dixin û têdikoşin e. Endamên platformê, li bajarên lê dijîn, li dijî polîtîka û hişmendiyê îqtîdara mêrê serdest a ku li dijî jinan dijminahiyê pêş dixê têdikoşe. Di hevdiyan hatin kirin de pirsgerêkên heyî û çareseriyê ji bo wan hatin parvekirin. Hat dîtin ku jin hem li qada kar û hem jî di jiyana li malê de, bi tundî, cudakarî û kedxwariyê re rû bi rû maye. Di hevdiyan li Edene, Bûrsa, Îzmir, Îskenderûn, Amed, Mêrdînê û di tevahiya hevdiyan hatin kirin de ev rastî derketiye holê. Di çarçoveya xebata me de em li 5 bajaran bi platformên jinan re hatin cem hev. Em bi rêxistinên jinan ên girêdayî 150 saziyan jinan û tevlihev ên ku di nav de naven-dên jinan, yekîneyên jinan ên girêdayî şaredariyan, serokên daîreyan, komele, vakîf, partiyên siyasî, rêxistinên sîvil, û komeleyên mafên mirovan jî hene re hatin cem hev.

Me di hevdiyan platformên jinan de; li ser xizaniya jinan, tundiya li ser jinan, rêbazên têkoşîna li dijî

tundiyê nîqaş pêş xist.

- Jinên ciwan ên endamên Platformê, diyar kirin ku hem di jiyana pêvajoya perwerdehiyê de bi cûdakarîyê re rû bi rû dimînin û hem jî nayên tayînkirin. Anîn ziman ku ji ber kar nabînin dikevin îcrayê û nikarin deynê krediyên KYK'ê bidin. Dîsa ji bo deynê wan betal bibe îqtîdar tiştekinake.
- Di nava platformê de, nûnerên komele û rêxistinên ku bi nexweşiyên EMS, SMA û hwd re têdikoşin, anîn ziman ku her çiqas li dijî van nexweşiyên têdikoşin û hewl didin îlacan bistînin jî, tu hewldana îqtîdarê ku heqê îlacan bide tune ye. Nexweşan terkî mirinê dikin.
- Jinên ku li kal, pîr û zarokan dinerin û xizmeta mirovan dikin, keda wan nayê dîtin. Jin bê ewle têne hiştin û di nava jiyana travmatîk de têne hiştin. Jinên ku bi tu awayî xizmeta civakî nagirin, mahkûmî xizanî û tunebûnê tenehiştin. Jin hawar û nerazibûnên xwe tînin ziman.
- Piştî îqtîdara AKP-MHP'e Peymana Stenbolê betal kir û dixwaze mafê nafakayê xezp bike, dîsa zagonên ku jinan diparêze naxin meriyetê, jinan bê parastin dihêlin. Bi van pêkanînan jin bi tundiyê re rû bi rû

dimînin û di malan de têne hepiskirin. Bi vê yekê tê xwistin ku jinan bê vîn bihêlin û têxin fermana mêr.

- Me dît ku di nava jinên di qada cemaweriyê de kar dikin de nêzikatiyên ku wan dixin nava pêşbirgê hene. Hat gotin ku ev feraset û nêzikatî raste rast ji aliyê îqtîdarê ve tê pêşxistin. Bi van nêzikatiyan tišta esil tê xwestin; armanc dikin ku jinan derxin dervê qada cemaweriyê. Divê jin nekevin vê kozikê. Ji bo vê yekê banga ku xwe bi rêxistin bikin hatiye kirin.
- Jinên bi KHK'ê hatine dûrxistin xebatên sendikayî dimeşînin. Ji ber ku li ked, destkeftî û mafên xwe xwedî derdikevin. Ji ber ku li dijî polîtîkayên îqtîdarê yên hilandinê çong dayanin. Ji ber vê yekê îqtîdar wan dikin hedef. Îqtîdar dixwaze wan bi xizanî, betalî û birçîbûnê terbiye bike.
- Di xebatên kooperatîfan ên bi projeyan û fonên derve tê destekirin û di projeyên têkildarî debara jinan de; yên esasî kedê dide û hilberînê dike jin in, lê li gel vê yekê, yên heqê herî erzan distînin dîsa jin in. Ev bi polîtîkayên zayendîperest ve girêdayî ye. Binê vê yekê hatiye xêzkirin.
- Li gel ku jin di qada cemaweriyê û sektorên taymet de bi mêran re heman karî dike jî, bêtir mêr têne ter-

cîhkirin. Mînak; li şûna muşevîra malî ya jin ku xwedî tecrûbe ye, Muşevîrê mêr ê ku nû dest bi kar kiriye tê tercîhkirin. Ev nîşan dide ku newekheviya zayendiya civakî heye. Hatiye destnîşan kirin ku di hemû beşên kar û pîşeyan de ev pirsgrêk tê jiyîn.

Pêşniyarên ku di hevdîtinên Platforma Jinan de derketin pêş

- Li dijî êrîşên li hemberî destkeftî û mafên jinan, bi taybetê li dijî biryara ve-kişandina ji Peymana Stenbolê, mezinkirina têkoşîna hevpar a li qadan;
- Li zanîngehan li dijî tundiyên zayendî vekirina yekîneyan;
- Tayînkirina jinên ku zanîngehê qedandina û tayîna wan nehatiye kirin;
- Kredi ödemelerinden kaynaklı genç kadınlara gelen icraların kaldırılması;
- Rakirina îcarayên ji bo jinên ciwan ku ji ber sedema deynên krediye tîn;
- Zêdekirina stargehên ji bo temenmezin û berastengdaran û bêperedayîna xiz-metên ji bo wan;

- Vekirina kreşan û xizmetdayînên bêpere;
- Hîn zêdetir hevdîtinên bi jinên koçber û penaberên ku bi polîtîyên cihêkariyê re rû bi rû dimînin;
- Têkilîdanîna bi aktîvistên jin ên koçber û penaberan û hîn zêdetir têkilîdanîna bi saziyên jinan ku bi van mijaran eleqeder dibin û têdikoşin;
- Li her qadê balkişandina li ser tundiya aboriyê ku di Peymana Stenbolê de der-bas dibe;
- Di bin banê rêveberiyên herêmî de hewldana pêşîvekirina hemû xebatên têkil-darî faaliyetên kooperatîfî; pêşxistina polîtîkayên bihêz û piştgiriya koope-ratîfên ku ji bo jinan tîn vekirin;
- Li dibistanan dayîna dersên wekheviya zayendiya civakî, meşandina xebatên hestiyariyê;
- Divê hîn zêdetir piştgirî bi jinên ku ji ber KHK'yan ji karên xwe bûn û ji neçarî li malên xwe hilberînan dikin, bê kirin;
- Hat diyarkirin ku divê Meclisa Jinan a HDP'ê pirsgrêkên jinên KHK'yiyan bi-be rojeva meclisê û têtildarî mijarê çalakîyên wek seminer, panel û hwd. pêk bîn.

EM WEK MECLISA JINAN A HDP'Ê;

- Daxwaza jinên ciwan ên zanîngehan di serî de wekî meclis em ê her derê bînin ziman û bişopînin.
- Em ê hevdîtînen xwe yên bi jinên KHK'yiyan bidomînin û piştgiriye mezin bikin.
- Di bin banê rêveberiyên herêmî de em ê kreşan zêde bikin û piştgirî bidin projeyên ku pêş îstîhdama jinan vedikin û ji nû ve bixin meriyetê.
- Em ê piştgirî bidin avakirina kooperatîfên jinan, em ê ji bo çêkirina polîtîkayên teşvîkê û ji bo bibin pêşeng hîn zêdetir têbikoşin.
- Em ê xebatên perwerdeyên ku ji bo afirandina hestiyariya zayendiya civakî, hîn zêdetir bikin.
- Em ê dev jê têkoşîna pêkanîna Peymana Stenbolê ku misogerîya jiyana jinan e, bernedin.

9- HEVDÎTÎNÊN BI JINÊN BERASTENG DAR RE

Li gorî dane yên TÛK'ê ya sala 2002'yan welatîyên berasteng ku sedî 12'ê nifusê digire nav xwe, ji perwerdeyê heta îstîhdamê ji her cureyên xizmetên piştgiriye bêpar mane. Jinên berastengdar li gorî mêtên berastengar hîn zêdetir bi bînpêkirînen mafan re rû bi rû dimînin û ev rewş dîsa ji newekheviya zayendiya civakî cudatir dest nayê girtin. Jinên berastengar bi xetereya tundî, îstîsmar û her cureyên bînpêkirînan re rû bi rû dimînin. Di civînê de me hem bi jinên astengdar û hem jî bi jinên xwedî li astengdaran re pirsgirêk, daxwaz û çareseriyên wan parve kir. Hemû xizmetên ku piştgirî didin kesên astengdar, Polîtîkayên Tenduristî û Civakî yên îdeolojiya kêmandamên serdest ên ku bi modela bijîjkî ve tê xwarin, ji aliyekî ve mafê jiyana serbixwe ya kesên berastengdar bi rêya 'Peraksiyona Lênêrîna li Malê' desteser kirin. Ji aliyê din ve jî hemû xizmet û erkên ku divê dewleta civakî bi hezar û 781 TL mehane bide malbatê, xistiye stûyê malbatê. Ji aliyê din ve jî bo stendian mûçeyan ku mijara gotinê ye jî dîsa gelek prosedurên pêk tîne. Ji bo jinên ku xizmeta lîênêrîna berastengdaran dide, vê xercê werbigire, divê kesên

berastengdar xwediyê rapora astengdariya giran bin. Di nebûna raporeke berastengdar a giran de, keda jinên ku xizmeta lênêrînê didin nayê dîtîn. Bi rastî ev heqê ku ji lênêrînê tê girtin têra hewcedariyên kesên berastengdar jî nake. Ji ber ku dermanên ku têne bikar anîn nakev nav çarçoveya SSK'yê û heqê wan giran e jî dibe sedema tengasiyek mezin. Rastiya ku jin bi vê sepanê mûçe distînin di daneyên TUÛKê de wekî daneyên îstîhdamê tên nîşandan. Lê belê jin û berastengdarên ku bi tu awayî teminata wan ên civakî tune ne, bi vê sepanê hepsî malê tên kirin, tev li tu çalakîyên civakî nabin û travmayên giran dijîn. Ji bo ferdên berastengdar jiyana malbatî-bi taybetî gelek caran redkirina berpirsariya bavan û hîn caran jî terkîrîna wan-pêvajoyên ku bi jinavderxistin re destpê dîke ji dema mezinbûnê heta pêşketinê belavî jiyana kar û hemû jiyana wan dibe. Di vê pêvajoyê de piştgiya herî mezin dayik dide û ev pêvajo ji aliyê jin ve jî dibe sedema xizaniyeke mezin. Zarokên ku jinavderxistinê civakî herî mezin di dema jiyana xwe ya perwerdeyê de dijîn, di dema destpêkirina dibistanê jî gelek zehmetiyan re rû bi rû dimînin. Sere-rastirina qanûnan, di jiyana zarokên berastengdaran de tu hêsanbûyînekê çê nake. Her wiha dîsa zarokên xwedî norocureyan ev jinavderxistinê bi awayekî girantir dijîn.

“Em neçarî ku zarokên xwe bifiroşin tîna hiştin. Raya giştî ya Tirkiyeyê fêr bû ku tu zarokên otîzmî nagirin dibistanan. Ez wisa her roj derdikevim medyaya heytî û vê tiştî dibêjim. Dibistan nadin me. Me gelek piştgirî girti lê yek dibistan jî negot ‘Were em ê bigirin’. Heta hîn kes ji me re gotin ku ‘hûn zarokên rast neanîne dinê.’”

Kesên gihîştî yên berastengdar bi taybetî jin piştî bi zehmetî temamkirina xwe yê perwerdeyê ve gavê di jiyana xwe ya kar de rastî her cureyên cihêkarî û jinavderxistina civakî re rû bi rû dimînin. Jinên berastengdar bi gotina ‘Hûn ê li derve zîrarê bibînin’ li malan tîna hepiskirin, gihîştina mafên xwe yê xebat û perwerdeyê bêpar dimînin. Jinên gihîştî yên berastengdar pirsgerêkên ku dijîn wiha anîn ziman: **“Hûn wekî jinek dema di rê de dimeşin; hûn qet ji kesên ku nasnakîna rastî pirsên zarokên we hene, dikarin bikevin tîkiliya zayendî, hatin? Di vê mijarê de çiqas baş bibin nebin ji aliyê civakî ve hatim kêma dimînin.”**

Jinên ku xizmetên berastengdaran dikin;

- Zêdetir vekirina malên hemşîreyan û kontrolên asayî;
- Saziyên lînêrînê ku hem wekî navendên lînêrîna rojane û hem jî wekî na-vendên lînêrîna razanî xizmetê bikin;
- Pisporiya saziyên lînêrînê;
- Kalîteya xizmetên lînêrînê;
- Ji nû ve organîzekirina pratîka lînêrîna malê, karûbarên lînêrînê wekî alter-natîfek gelemperî;
- Rakirina cihêkariyê di peydakirina karmendên astengdar de;
- Divê bê zanîn ku kesên berastengdarên derûnî jî dema ku ji bo personelên as-tengdar têne peydakirin tedbîrên taybetî bêne girtin;
- Pêkanîna plana çalakiya otîzmê;
- Aktîfkirina Komîsyona Lêkolînê ya Meclisê ya ku ji bo diyarkirina tedbîrên ji bo çareserkirina pirsgerêkên kesên nerazî û malbatên wan hatiye avakirin;

- Avakirina mekanîzmayên ji bo piştgirîkirina dê û bavên ku zarokên wan piştî teşhîsa yekem astengdar in;
- Di heman demê de ji bo bavan meşandina xebatên hişyariyê;
- Rakirina kêmasiyên di perwerdeya taybet a zarokên berastengdar de, sere-rastkirina bernameyên çewt;
- Derbarê dibistanên ku nepêkanîna mijara li hev fêrkirîna de ji aliyê Wezarata Perwerdeyê ya Millî ve pêkanîna cezayan;
- Okula gidemeyecêk yetî fêrkirîna olan engelli çocuklara yönelik özel eğitim merkezlerinin çoğaltılmasını;
- Zêdekirina navendên perwerdeya taybet ji bo zarokên berastengdar ku nikarin biçin dibistanê;
- Daxwaza pêkanîna jiyanek bê asteng dike.

WEKÎ MECLISA JINAN A HDP'Ê;

- Em ê zêdetir ji bo pêkanîna polîtîkayên ku jinên berastengdar di hemû qadên jiyane de serbixwe dikin, perwerde, aborî, jiyana siyasî û çandî de û ji bo bici-hanîna daxwazên jinên ku neçar in hemû erkên dewleta civakî bi cih binin, navê "Pirtûka lînêrîna astengdaran", muxalefet bikin.
- Em ê ji bo zêdekirina navendên jiyane ku ji wela-tiyên berastengdaran re dibin alîkar, xebatên qanûnî bidin meşandin.
- Ji bo pêkanîna plana çalakiya otîzmê û aktîvkirina komîsyona têkildar em ê bi pirs û pêşniyarên lêkolînê dev ji rojeva xwe bernedin.
- Dema ku pêşengtiya polîtîkayên azadîxwaz ên ku serxwebûna kesên beras-tengdar ên ku di çarçoveya pratîkên lînêrîna malê de, di malên xwe de girtî ne diparêzin, em ê bi jinên ku bi kesên berastengdaran re bi hev re girtî ne û meh-kumê tînêtiya civakî re rû bi rû dimînin re di nav hev girtineke mezin de bin.
- Ji bo zêdekirina navendên perwerdeyên taybet em ê xebatên qanûnê bidin destpêkirin û bibin şopdarê wê.

- Em ê şopdarê avakirina navendên desteka jiyane yê bi destkeftî bin ku mafê jiyaneke ewle ji bo jinên berastengdar ên ku rastî polîtîkayên zayendperestî û tundiya mêran a hestyarî û fizîkî ya ku ew derdixe, misoger bikin.
- Em ê têkoşînê mezin bikin û jiyana bê asteng ji bi hev re ava bikin.

10- KOMXEBATÊN BUDCEYA JINAN

Me di meclisê de dema diketin pêvajoya budceyê, ji bo nirxandina daneyên ku di çarçoveya kampanyaya 'Ji Xizaniya Jinan re Na, Ji bo Jinan Edalet' li zeviyên, fabrîkayan, gundan, malan, kolanan hevdînan bi jinan û saziyên jinan re hatine bidestxistin û di dema pêvajoya budceyê de ji bo bi awayekî xurt pêşkêşkirina daxwazên jinan komxebata bi navê 'Budceya Hestiyariya Zayendî ya Civakî' pêk anîn. Jinên tev li komxebatên ku li Mêrdîn, Enqere û Stenbolê pêk hatin, bûn, bi tevlibûna akademisyen û jinên ku di qada kedê de dixebitin pêk hatin. Bingeha komxebatên me xwe dispêre jinên ku em bi wan re li zeviyên, fabrîkayan û kolanan hatin gel hev.

Encam û daxwazên me yê ku di encama xebatên me yê ku li dijî budceya şer û qesrê bi gotina 'Bu-

dceya Hestiyariya Zayendî ya Civakî pêk hatin de derketin holê;

- Divê ji bo jinan xizmetên perwerde, tenduristiyê û edaletê bê pere pêk bên.
- Alîkariya civakî li ser bingehê mafan be û zihniyeta ku jinan di bin navê pe-reyên lînêrînê de li malên heps dike, were terikandin.
- Divê sîyaseta bacê ya adil bê avakirin û bac ji bo hilberîna xizmetên giştî yên bi kalîte bên bikaranîn.
- Divê bacên li ser av, germbûn, înternet, xurekên bingehîn û mûçeyên kêmtirîn bên rakirin.
- Divê ji jinên ku dixebitin an kêmbac bê girtin an jî qet bac neyê girtin.
- Divê STK'yên ku piştgirî didin jinan ji aliyê dewletê ve bên destekkirin. Divê ev STK'yan di pêvaşoya budceyê xwe xwedî gotin bin.
- Divê li dijî tacîz û tundiya li kargehan Peymana ILO190 bê îmzekirin.
- Divê budce li hemberî zayendiya civakî hestiyar be û îbareya zayendiya civakî di plansaziya pêşketinê

de jinûve bê bikaranîn.

- Ji bo vegera jinan a perwerdeyê û bidestxistina şarezayiya pîşeyî bûdçe bê veqetandin.
- Divê pirsgirêka jinan a wargehan bê çareserkin. Ji xwendekaran re piştgiriya kirê bê dayîn û jiyana wan a perwerdeyê bê parastin.
- Eşit îşe eşdeğer ücret talebi karşılanmalıdır.
- Saziyên cemawerî û rêveberiyên herêmî di serî de li her derê kotaya jinan bike-ve meriyete. Polîtîkayên ku îstîhdama jinan teşfîk dikin bên pêşxistin.
- Ji jinan re piştgiriya xizmeta şewra aboriyê bê dayîn û destek ji jinên ku dixwa-zin bikevin nav hewldana kar, bê dayîn.
- Di serdema jîriya çêkirî û înfomatîk de, divê parek ji jinên xebatkarên enfor-matîk ên di pergala xebata dijîtal de, bê dayîn. Ji bo zêdekirina xwendin û nivîsandina dijîtal a jinan divê budce were veqetandin.
- Ji bo jinan ku li malê dixebitin budce bê veqetandin, ji bo nexweşiyên pîşeyê xizmeta tenduristiyê bêpere bê dayîn. Ev xebatkarên ku hejmara wan a sîgorta û cihê kar nîn e, mafê avakirina sendîkayê

bên dayîn. Temînata teqawitîyê ji jinên ku li malan dixebitin bê dayîn.

- Li hemberî nexuyabûna keda malê, divê mafê tenduristîyê û teqawidbûnê ji ji-nan re were dayîn. Divê parek ji aboriya lînêrînê were veqetandin. Barê nexweş, kal, pîr, berastengdar û lînêrîna zarokan ku ji ber rola zayendî li ser jinan tê ferzkirin, divê ji aliyê sazîyên dewletê ve bê pere bên girtin.
- Ji budceyê parek ji bo îstîhdamkirina karkerên jin ên ku di çarçoveya Qanûna 29'an de ji kar hatine derxistin bê veqetandin.
- Tevlibûna jinên penaber di kar de û muayeneya tenduristîyê ya bêpere bê mi-sogerkirin.
- Divê budceya kreşên zarokan ên ku li kargehên ku ji 50'ê zêdetir karker lê têde hene bê vekirin, ji navendê bê dayîn.
- Ji personelên navenda şêwirmendiya ŞONÎM re budceyên realîst bên veqetandin. Li her cihekî ku nifûsa wê ji 50 hezar zêdetir e, divê stargeh hebin û budce ji bo xebatkarên van stargehan bi têra xwe bên veqetandin. Divê star-gehên ku hemû nasnameyên zayendî tê de bin, bên pey dakirin.

- Piştî derketina ji stargehan divê jin di warê debara jiyânê, rûniştin û kar de bên şopandin û destek-kirin. Ji bo jinên ku naxwazin li stargehan bijîn divê xaniyên civakî û piştgiriya aborî ji wan re bê dayîn.
- Piştgiriya qanûnî ya ji bo jinên ku rastî tundiyê tên, divê budceyê bê dayîn. Divê ji aliyê dewletê ve li dadgehên 'Navenda krîza tundiya zayendî' bên ava-kirin.
- Ji bo perwerdeya bi zimanê zikmakî budce bê veqetandin. Divê polên pîrzimanî vê avakirin.
- Divê her kesên ku di qadên cameweriyê de dixebitin, tev li perwerdeyên za-yendiya civakî bibin.
- Ji bo ku jin xizmeta tenduristîyê bi zimanê xwe yê zikmakî werbigirin, divê wergêrên jin li navendên tenduristîyê bên girtin.
- Divê budceya tenduristîyê ji bo transên ku di pêvajoya verastkirina laş de nika-rin bigihîjin mafê tenduristîyê bê dayîn.
- Derbarê pereyên ku ji bo jinên girtî tê veqetandin divê verastkirina berfireh a budceyê bê kirin.
- Divê KEFEK berpirsariyên xwe bi cih bîne.

ENCAM

Encamên ku di hevdîtin û serlêdana jinan de derketin holê ev in: Li ku xizaniyek hebe teqez li wir jin hene. Li ku derê welat dibe bila bibe xizanî û kedxwarî li jinan tê ferzkirin. Careke din derket holê ku tifaqa mêran a AKP-MHP'ê ji bo pirsgirêka kûrbûna xizaniya jinan çareserî nîne. Ev tenê fikrê me nîn e. Ev fikr fikra hevpar a hemû jinan e ku me bi wan re hevdîtin pêk aniye. Ji ber vê yeke li dijî xizaniya ku mêrê serdest li ser jinan ferz dike, yekane çareserî têkoşîna hevpar a jinan e. Rêya herî girîng a pêkanîna hem daxwazên jinan û hem jî pêşniyarên ku em pêşkêşê hev dikin, em bi hev re, têkoşîna xwe berfireh bikin û bi pêşengiya jinan jiyaneke nû ava bikin, tifaqa xwe ya jinan ava bikin.

Wekî Meclisa Jinan a HDP'ê tu carî nêzîkatiyeke me ya ku wadan bide jinan nebû. Ji destpêka xebatê ve li ser esasê guhdarkirina jinan, di her mekanîzmaya ku em tê de ne de deng û daxwazên xwe tînin ziman û ji bo pêkanîna van daxwazan bi hev re têdikoşin.

Kampanyaya me ya 'Ji Xizaniya Jinan re Na, Ji bo Jinan Edalet' bi dawî nebûye. Bi sernav û naverokên cuda, em ê hevdîtin, yekkirina deng û daxwazên jinan bidomînin. Li dijî polîtîkayên dijminê jinan ên tifaqa mêran a AKP-MHP'ê, em ê bi hemû jinan re xeta xwe ya nû ya têkoşînê xêz bikin. Bi têkoşîn û piştewaniya jinan teqez û teqez em ê bi ser bikevin.

Meclisa Jinan a HDP'ê

MECLISA JINAN A HDP'Ê

RAPORA

XIZANIYÊ YA

JINAN

